

Prof. Îsmet Şerîf Wanlî (1924 - 9.11.2011)
Serê Gelê Kurd Sax Be!

Konê Reş

Di roja 9.11.2011an de, roja xwepêşandana ku bi biryara Kongereya Niştimanî Ya Kurdî Li Sûriyê hatibû pêk anîn û Kurd bi deh hezeran derketin kolanên Qamişlo, doza azadî û serbestiyê dikirin, di eynî rojê de, li Swîsrayê, siyasetmedar û nivîskarê Kurd yê navdar Îsmet Şerîf Wanlî di seat di 04.00 sibehê de li nexweşxaneyê CHUV a Lozanê koça dawî kir.

Îsmet Şerîf Wanlî 87 sal kiribûn, ji sala 1948 an de li bajarê Lozana Swîsreyê dijiya. Ew di 21ê berfanbara 1924 an de li gundekî nêzîkî Şamê paytexta Sûriyeyê ji dayîk bibû, di salên zaroktiya xwe de çav bi



welatparêz û rewşembîrên Kurd wek mîr Celadet Bedirxan, Qedrî û Ekrem Cemilpaşa, Dr. Ehmed Nafîz û birayê wî Nûredîn Zaza, Elî axa Zilfo.. ketibû û ji wan fêrî Kurdperweriyê bibû û wiha wî jî xwe berdabû nav têkoşîn û berxwedanê di ber gelê xwe de.. Ji sala 1948 ve li derveyî welat bû. Li Swîsrayê di warê felsefe û hiqûqê de dîploma xwe wergirtibû û dersên siyasetzaniyê didan.. Her wiha di salên 1960-1962 an de jî li zanîngeha Sorbonê li ser Kurdnasiyê ders dane.. Di sala 1961 de li ser daxwaza Barzaniyê nemir çûye Kurdistana başûr û zîviriye Ewropa nûneritiya Tevgera Başûrê Kurdistanê a bi serokatiya Mela Mistefa Barzaniyê nemir kiriye.. Di sala 1995 de tevî Parlemantoya Kurdistanê ya Derveyê Welat (PKDW) ya ku di 1995'ê de hatibû damezrandin bibû. Di sala 1999 de dema Kongreya Netewî ya Kurdistanê (KNK) hatibû damezrandin. Ew bibû serokê KNK ê û demeke dirêj serokatiya wê kiribû.

Gelek berhem û pirtûkên wî bi zimanên biyanî derketine. Ji wan berhemên pirtûka bi navê **Li Tirkiyeyê Pirsgirêka Netewî ya Kurdan** û gelek berhemên wî yên din jî hene. Bi jinek Swîsreyî re zewicî bû û li Lozana Swîsreyê jiyana xwe derbas dikir.

Ji gotinên wî derbarî zimanê Kurdî de: Li zimanê Kurdî û kultura Kurdî xwedî derkevin.. Hemû Kurd, bela li ziman û kultura xwe xwedî derkevin, lê zêdetir divê yên derveyî Kurdistanê lê xwedî derkevin.. Erê, Îsmet Şerîf Wanlî xwendina xwe li dervî Kurdistanê; Libnan, Swîsra, Franse û DYA'yê kiribû wiha jî li xerîbiyê fêrî zimanê xwe yê zikmakî bibû. Li ser fêrkirina wî ji zimanê Kurdî re wiha digot: Her kes li derveyê welat zimanê xwe ji bîr dike, lê ez li derveyê welat fêrî Kurdî bûm. Di heyamê çetîn û dijwar de Îsmet Şerîf Wanlî dengê Kurdistanê bû, dengê Kurdên rojava bû. Ez xemgînî û mixabiniya xwe ji malbata wî û gelê kurd re pêşkêş dikim û ji Yezdanê dilovan bi hêvî me ku cihê wî bihiştê rengîn be û dawî dibêjim: Serê gelê Kurd sax be.

Konê Reş, Qamişlo/ 09.11.2011
Ev gotar ji malpera Welatê me hatiye girtin.

Bi boneya sersala 2012an û deh heyvên bi xwîn di ser serhildana gelê Sûriyê dibore re, komîta weşana Newrozê gelê Sûriyê pîroz dike û hêviya serkeftin û sefiraziyê jê re dixwez e.